
المركز السوري للإعلام وحرية التعبير
Navenda Sûrîyayî ya Ragihandinê û Azadîya Derbirînê
Syrian Center for Media and Freedom of Expression



# Romalkirina ragihandina Sûriyê ji petaya covid-19 re

Lêkolîn, şirovekirin û naverok

Pûşper 2021

# Naverok:


KURTEYA CÎBICÎKAR.....2

PÊŞGOTIN.....3

PIRSGIRÊKA LÊKOLÎNÊ.....5

ARMANCÊN LÊKOLÎNÊ.....6

GIRÎNGIYA LÊKOLÎNÊ.....6

GUHERTINÊN LÊKOLÎNÊ.....6

FEREDIYÊN LÊKOLÎNÊ.....6

RÊBAZA LÊKOLÎNÊ.....7

CIVAKA LÊKOLÎNÊ.....7

ENCAMÊN LÊKOLÎNÊ.....8

- Werzê yekê: Guhdana alavên ragihandina Sûriyê ji petaya Covid-19 re.....8
- Werzê duyem: Bandora siyasî li ser romalkirina rojnamevanî ji petaya covid-19 li Sûriyê de.....15
- Werzê sêyem: Danûstandin bi koma zanyariyên şaş û gotegotan re.....18

Pêşniyarên.....29

# kurteya Cîbicîkar:

- Li ser asta cîhanê petaya covid-19 alavên rojnamegerî û li pêş rûbirûbûyên nû danî, ku ew rûbirûbûyên nû bû barekî din li ser rewşa metirsîdar ya Sûriyê tê re derbas dibe, nexasim di siya astengiyên ku Hikûmeta Sûriyê û deshelatdariyên dîfakto li ser azadiya xwegihiştina zanyarî û belavkirina wan li gorî belgeyên yasayî bêserûber yan di rêya tirsandin û binpêkirinên di dermafê rojnamevanan de radibin, ew yek hişt ku kelem û rêgirî derbarê rojnamegeriyê de li pêş pêşkêşkirina zanyariyan rast û dirust derbarê belavbûna petaya koronayê di welêt de çê bibin.

- Navenda Sûrî ya Ragihandin û Azadiya Derbirînê, 154 gotarên rojnamevanî û bêtir 136 demijmêrên weşanên T.V û radiyo di sê heftiyên yekê di meha Adara 2020an şopandin, da ku xwe bigihîne nîşanên serekî derbarê çawaniya romalkirina ragihandina Sûriyê ji nûçeyên petaya koronayê re. Li gor datayên bi dest me ketine, kêmasiyên mezin di romalkirina alavên rojnamegeriya Sûriyê de hebûn, bi taybetî di berbarê belavkirina zanyariyên rast û serastkitina gotegotan, nirxadin li ser nîşanên karê ragihandinê û pênasîna fermî ya ku rêxistina UNESCO di çarçoveya petaya koronayê COVID-19 ji alavên têkiliyan re pêşkêş kirin re hatiye belavkirin. Herweha di dema şopandinê de li gorî şiroveya datayên ku bi dest me ketine diyar dibe ku, alavên ragihandinê nikarîbû amêr û kelûpelên pêşwîst ji bo vekolîna nûçeyan rast de bi kar bîne herweha hin goman li ser zanyariyên ku Hikûmeta Sûriyê li ser belavbûna nexweşiyê di welêt de pêşkêş dike hene.

- Cûdabûn di nerînên siyasî de bandoreke zelal li ser çawaniya danûstandina bi petayê û guhdanên serekî ji alavên ragihandinê re di dema romalkirinê de hebû, ew yek diyar dike ku bandoreke çespandî li ser nerînên siyasî di derbarê romalkirina nûçeyên petayê di Sûriyê de heye, ew yek dihêle ku bangek ji hikûmeta Sûriyê û desthelatdariya dîfakto re were şandin ku, destêwerdanê di belavkirina zanyariyan derbarê nexweşiyê de nekin.

# Pêşgotin

Berbelavbûna zêde ye peteya COVID-19 ku bûye sedema cure nû yê koronayê belav bûye yan jî weke bi navê cov-sar-19 tê naskirin hişt ku pêwistiya xelkê li seranserî cîhanê bi tibabeke mezin bi zanyariyên derbarê huşyarkirina ji nexweşiyê û nevçeyên belavbûna wê hebe, serbarî zanyariyên ku pêwîst were zanîn li ser rêkarên hikûmî yên girêdayî bi çawaniya bersivdanê bi nexweşiyê re.

Bidestxistina zanyariyan hûrbînî û piştrastkiriî di gelek deman de weke cûdabûneke navbera jiyan û mirinê de bû, di van rewşan de bersivdana alavên ragihandinê ji pêşhateyên petayê û curê zanyariyên belavbûyî li ser platformên cûda, herweha belavbûna berfereh ji zanyariyên şaş û gotegotên girêdayî bi dilgiranî derdikeve gefek mezin ji karê dazgehên pizîşkî û bazneya tendirustî bi giştî rê çê dike. Ev rûbirûbûn ducarî asteng bû, zehmetiya xwegihandina rojnamevnan bo zanyariyên rast derbarê belavbûa petayê û metirsiyên girêdayî karê rojnamevanan di navçeyên cûda li welêt hişt ku karê dezgahên rajnamegeriyê di her cihekî di Sûriyê de di bidesxistina zaniyariyan û veguhestina wan zaniyariyan ji Sûriyan re bêtir zehmet û asteng bibe.

Herweha pirbûna lêvegerên tundirustî ji ber dabeşkirina destheladariyên dîfakto û Hikûmeta Sûriyê di welêt de hişt ku jêder û çavkaniyeke giştî li ser asta welêt tune be da ku rêkarên giştî û zanyariyên girêdayî bi mijarê ji welatiyan re yan ji rojnamevanan re pêşkêş bike, hin rewş[1] hatin tomarkirin ku nakokiyên navbera wan hêzan de roleke xwe di gihandina agahiyên şaş û nerast ji şêniyên deverê derbarê hejmara pêketiyan de lîst.

Li gorî pisporiya xwe ya berê di proseya şopandin û şirovekirina gotara rojnamegeriya sûrî de, û li gorî çavdêriya xwe ji binpêkirinên ku karmendên di warê rojnamevaniyê di Sûriyê de kar dikin û astengiyên ji aliyên nakokdar ve rastî tên, Navenda Sûrî ya Ragihandin û Azadiya Derbirînê proseyek di şopandin û şirovekirina ji berhema rojnamevanî di welêt de bi mebesta gelek mebestan encam da ji wan şopandina gotara tundûtûjî, neheziyê û zanyariyên şaş,

serbarî şopandina binpêkirinên di dermafê rojnamegerî û jîngeha kar û alavên rojnamegeriyê di Sûriyê de, di vê derbarê de gelek lêkolîn derketin wek lêkolîna gotara neheziyê û handana tundûtûjiyê di ragihadina Sûriyê de.

Di lêkolîna niha de lêkolînerên Navenda Sûrî ya Ragihandin û Azadiya Derbirînê proseyek di warê şopandina giştî ji alavên ragihandinê ya ji sûriyan re di her deverekê be encam daye, da ku rola alavên Sûriyê di çarçoveya petaya Covid-19 de bişopîne û bibe çavdêr, û karînên wê di rabûna bi rola pêwîst di pêşkêşkirina zanyariyên piştrastkirî ji bo alîkarîkirina sûriyan di dûrxistin ji metirsiyan bipîve, herweha derencamên nakokiyên siyasî li ser wê romalkirinê û çawaniya pêşkêşkirinê bişopîne.

## Pirsgirêka lêkolînê

Sûriyê ji ber şer û destdanîna desthelatdariya dîfakto û nakokdar bi hev re û bi hikûmeta Sûriyê re dinale gelek caran weke welatê herî metirsîdar li ser jiyana rojnamevanan e, ew yek hiştiye ku veguhestina zanyariyên piştrastkirî derbarê belavbûna petaya koronayê, û deverên berbelavbûna wê gelek zehmet be.

Ev lêkolîn hewil dide ku careke din li karê ragihandina xwecihî sûrî bi hemû reng û curên xwe di serdema petaya Covid-19 li Sûriyê sala 2020an de vegere, hewil dide çawaniya kar û veguhestina zanyariyên girêdayî bi mijarên taybet bi petayê şirove bike. Herweha ev lêkolîn dê rewşa rojnamevanan li Sûriyê û welatên dirawse de kar dikin şirove bike, di çarçoveya petaya koronayê û çawaniya bandorbûna wan bi nexweşiyê û çawaniya karînên wan li ser rabûna bi karê xwe di gihandina zanyariyên rast ji bo welatiyan re.

Rêxistina UNESCO dibêje ku rolên erênî ya alavên peywendiyan û veguhestina zanyariyan di dema petaya Covid-19 di van xalan de cihê xwe digire:

- Parvekirina zanyariyên rizgarkar ji jiyanê re, û diyarkirina zanyariyên şaş.
- Bihêzkirina sûdwergirtina ji mafê bingehîn ji bo sûdwergirtina ji zaniyariyan.
- Bihêzkirina bikaranîna alavên ragihandina ku di berjewendiya giştî, û teknolojiya zaniyarî û peywendiyan de ne.

Lewra sazkirina pirsa lêkolînê li ser rola pêşbînîkirî ji ji alavên ragihandinê di veguhestina zaniyaryên rizgarkar û diyarkirina zaniyaryên şaş û bihêzkirina mafê sûriyan di sûdwergirtina ji zanyariyên pêwîst de hatine danîn da ku biryarên dirust derbarê jiyana wan de di belavbûna petayê de werin standin:

- Gelo alavên ragihandina Sûriyê yên xwecihî, zanyariyên pêwîst derbarê belavbûna petaya Covid-19 de belav kirine, gelo ew zaniyarî bawerpêkirî bûn?
- Rewşa ku karê rojnamevanan di veguhstina nûçeyan di çarçoveya petaya koronayê de çi rewş bû?
- Gelo alavên ragihandina Sûriyê derfeta baş da ji bo romalkirina petaya ku jê vayros korona çê dibe?

Herweha rêka pawankarîkirina derfeta destnîşankirî ji bo romalkirina pêşhateyên petayê û curên jêderan û pîvanên rojnamegeriya ku hatine bikarnîn di veguhetina nûçeyê de dê wer gengeşekirin? Mijarên girêdayî bi wê romalê ve çi ne? Gelo bandora nakokiya siyasî li ser wê romalê di welêt de hebû û çawa?

## Armancên lêkolînê

Ev lêkolîn hate danîn bi mebesta destnîşankirina bersivên rastiyane derbarê van pirsan de ye:

- Gelo alavên ragihandina Sûriyê, zanyariyên pêwîst derbarê belavbûna petaya Covid-19 de belav kiriye, gelo ew zanyarî bawerpêkirî bûn?
- Rewşa ku karê rojnamevanan di veguhstina nûçeyan di çarçoveya petaya koronayê de çi rewş bû?
- Gelo alavên ragihandina Sûriyê derfeta baş da ji bo romalkirina petaya ku jê vayros korona çê dibe?

Herweha rêka pawankarîkirina derfeta destnîşankirî ji bo romalkirina pêşhateyên petayê û curên jêderan û pîvanên rojnamegeriya ku hatine bikarnîn di veguhetina nûçeyê de dê wer gengeşekirin? Mijarên girêdayî bi wê romalê ve çi ne? Gelo bandora nakokiya siyasî li ser wê romalê di welêt de hebû û çawa?

## Girîngiya lêkolînê

Ta niha tu lêkolînên giştî ji nirxandina karê ragihandina Sûriyê bi hemû nerînên xwe re di petaya koronayê de tune ye, tevî girîngiya veguhestina zanyariyên rast di rewşa ku Sûriyê tê re derbas dibe di kêmbûna xizmetguzariyan û paşketina mezin di warê xizmetguzariyên tundirustî de ku dihêle xweparastin ji patayê zehmetir bibe.

## Guhertinên lêkolînê

**Guhertina bi ser ve:** Madeyên ragihandinî û rojnamegeriyê yên girîdayî bi petaya koronayê re.
**Guhertina serbixwe:** Curên madeyên rojnamegeriyê, û curên jêderan, û dema wê.

## Ferediyên lêkolînê

- **Ferdediya yekê:** Kêmbûnek di zanyariyaên rast derbarê belavbûna petaya koronayê di alavên ragihandna Sûriyê bi hemû aliyên xwe ve heye.
- **Frediya duyem:** Cûdabûnek li ser bingeha siyasî di şêweya danûstandina alavên ragihandina Sûriyê di petayê de heye.
- **Frediya sêyem:** Alavên ragihandina Sûriyê nikarîbû bi ektîvî bi belavbûna zanyariyên şaş re bide û bistîne.

## Rêbaza lêkolînê

Lêkolîn rêbazeka rast û şirovekirî herweha ya rêbaza berewerdekirî ji bo ku ciyawazî di navbera karê curên rojnamegeriyê di veguhestin û huşyarkirina sûriyan di rewşên petayê de bi kar tîne. Ji bo wergirtina dateyên tibab û curên taybet bi kar û berhemanîna rojnamegeriya Sûriyê desteke forma şirovekirina nevaroka bi kar tine.

Herweha lêkolîn desteke hevpeyvînê bi kesayetiyan re ji rojnamegeriya xwecihî sûrî re bi kar tîne, da ku ronî bixe ser metirsî û astengiyên ku di dema berhemanîna madeyên rojnamevanî yên girêdayî bi petaya Covid-19, 5 hevdîtin  bi endamên di desteya nûçesaziya dezgehên ragihandî sûrî re di meha Adara 2021ê de çê kirine ew jî bi armanca ronîxistinê ser hin aliyên ku eger heye şopandin û şirovekirina naverokê diyar nekiriye.

Serbarî wê yekê jî bersivname li ser 30 rojnamevanî sûrî di hundir û derveyî welêt kar dikin hatin belavkirin da ku bersiva çawaniya karkirina wan û şêweya bersivdana dezgehên wan bi petaya covid-19 re dikin, ew derencamên wê bersivnameyê di demekê bê de were belavkirin.

## Civaka lêkolînê

Civaka lêkolînê alavên ragihandina Sûriyê bi hemû deverên dabeşbûna wan û curên karên wan (Xwendinî, bihistî, dîtinî) û her yek li gorî hebûna demoxrafî; (Alavên ragihandinê di deverên hikûmeta Sûriyê, alavên ragihandinê di deverên Rêveberiya Xweser, alavên ragihandinê li derveyî Sûriyê). Hema li ser naveroka lêkolînê lêkolîneran madeyên nediyarkirî di rêya pişkê re destnîşan kirin bê ku berhema giştî ya karê dezgehên hilbijartî di her sê heftiyên yekem di meha Tîrmeha[2] sala 2020an- dûbare bikin peyvên lêkolînê ji 24 dezgehên ragihandinî ku nûneratiya her aliyên navbûrî dike.

# Encamên Lêkolînê

## Werzê yekê: Guhdana alavên ragihandina Sûriyê ji petaya Covid-19 re

Di vê werzê ji lêkolînê de hewla tekezkirin yan redkirina feerdiya yekê dide ya ku dibêje; Kêmbûnek ji zaniyariyan piştrastkirî û fermî derbarê belavbûna petaya koronayê di alavên ragihandina Sûriyê bi hemû aliyên xwe ve heye.
Ew jî di rêya nêzîkirina datayên lêkolînê û şirovekirina wê û berewedkirina navbera alavên ragihandina bi giştî di derbarê hewlên xwegihandina zanyariyan herî rast derbarê petaya koronayê de, û belavkirina wan ji şopîneran di Sûriyê de, kar dê li ser datayên ku hatine komkirin di rêya şopandina beşên ku madeyên derbarê petaya COVID-19 de were spartin, herweha dê li ser curên rojnamegeriyê ku ev naveroka belavkirî jê pêk hatiye wer belavkririn, da ku xwe bigihin zanyariyên herî rast di beşeke romalkirinê de.

Di rêya datayên lêkolîna ku bi dest me ketine diyar dibe, bilindbûna naverast di hejmara madeyên girêdayî bi petaya koronayê di ragihandina Sûriyê de heye, di herdu curên ragihandina bihîstî û dîtinî heye ku rêjeya şopandinê di ragihandina dîtinî de gihiştiye 59.59% û 67.44% ji ragihandina bihîstî re, rêjeya 28.4% di ragihandina xwendinî de derbas nekiriye rêjeya herî kêm e. Divê ameje were kirin ku ev rêje hemû aliyên siyasî yên alavên ragihandinê li Sûriyê û derdorê û yên hatine şopandin li xwe digre. Sedema bilindbûna asta romalkirinê di dema şopandinê ew e ku gelek behsa belavbûna petayê di welêt de hat kirin û bilindbûna rêjeya pêketiyan ku ji aliyên fermî ve ji hikûmeta Sûriyê û destheladariyên dîfakto ve hatiye ragihandin. Tevî asta romalkirina petayê di ragihandina Sûriyê bilind bû, di lêvegera beşên rojnamegeriyê yên ku made belav kirine, û curên madeyên rojnamegeriyê yên girêdayê bi petaya covid-19 re, wêneyek berûvajî ji hejmarên destpêkî dide ku diyar dibe ragihandina Sûriyê romaleke baş û berfereh ji petayê re kiriye.

Li aliyekî din, di cûdabûna romalkirina navbera alavên ragihandina dîtinî, bihîstî û xwendinî di petaya covid-19 diyar bû ku alavên ragihandinê guhdanek dîtinî ji ya xwendinî bêtir daye romalkirina nûçeyên petayê, lê di curên madeyên rojnamegerî di her curek ji curên alavên rojnemegeriyê diyar dibe ku cûdabûn di navberokê de heye.

| Curê ragihandinê | Şopandina giştî | Dûbarekirina şopanidna girêdayî bi petaya koronayê | Xulên giştî yên şopandinê | Dûbarekir na xulên şopanidna girêdayî bi petaya koronayê | Naverasta rêjeya şopandina ragihandinê ji koronayê re |
|---|---|---|---|---|---|
| Ragihandina xwendinî | 154 | 40 | - | - | 28.24% |
| Ragihandina dîtinî | 129 | 70 | 4178 | 2525 | 59.59% |
| Ragihandina bihîstî | 107 | 57 | 3997 | 2462 | 67.44% |
| Hejmara dawiyê | **390** | **167** | **8175** | **4987** | **51.75%** |


Şêweya hejmar (1) rêjeya romalkirina alavên ragihandinê ji petaya koronaya nû re diyar dike.

Li gorî datayên di rêya proseya şopandina xwendinî ku rojname, malper û ajensên nûçeyan li xwe digire bi dest me ketine, 37.5% ji madeyên tê de belavkirî, û yên girêdayî bi petaya covid-19, li beşê tendirustiya xwecihî belav bûne, ew made li ser zaniyariyên pizîşkî û romalkirina bersivdana kadrên tendirustî ji petayê re li Sûriyê de hatin belavkirin, rêjeya giştî ya madeyên girêdayî bi beşên tendirustiyê ji xwecihî û cîhanî gihişt 42.5% ew rêje dike nîvî hejmara madeyên girêdayî bi petayê re. Li hember de rêjeya madeyên girêdayî bi petayê yên belavkirî di beşên aborî û bijêwa xwecihî bi rêjeya 30% bû û yên di beşê siyasiya xwecihî de belavbûyî 7.5% bû.

Li ser wê yekê diyar dibe ku alavên ragihandina xwendinî yên sûrî guhdan bi belavkirina zanyariyên rast derbarê petaya covid-19 de daye, li beramber de daketina rêjeya madeyên rojnamegerî di alavên ragihandina xwendinî yên girêdayî bi petayê xuya dike ku ew romalkirin nikare hemû zaniyariyan derbarê hejmara pêketiyên bi fermî hatine ragihandin di dema ku nexweşî di lotkeyê de bigihîne bi taybetî madeyên belavkirî di beşên girêdayî bi tendirustiya giştî ji hejmara giştî ji madeyên ku roniyek mezin li ser derencamên aborî û civakî li ser petayê xistiye kêmtir e.

Tevî alavên ragihandina xwendinî guhdan dane ku zanyariyên girêdayî bi tendirustiya giştî û rewşa tendirustî di welêt de pêşkêş bike, lê paşketina rêjeya romalkirinê berewerd bi alavên ragihadina kevin yên din re dihêle ku daketinek di rêjeya naverokên ku zanyariyên tendirustî û romalkirina nûçeyên belavbûna petayê çê dike ku ew zaniyarî weke bi rizgarkar ji jiyana mirov re tê naskirin û ji rêxistina UNESCO ve ji bo alavên peywendiyê di petaya covid-19 hatiye binavkirin.

## Belvbûna rêjeya beşê ku petaya koronayê di ragihandina xwendinî de hatiye





Şêweya hejmar (2) rêjeya belavbûna madeyên girêdayî bi petaya covid-19 di beşên rojnamegerî di alavên ragihandina xwendinî de diyar dike.

Li gorî curên madeyên rojnamegerî yên girêdayî bi petaya covid-19 yên di alavên ragihandina xwendinî di her aliyeke siyasî de belav bûne em dibînin ku 90% jê ser bi curê nûçeya rojnamegerî ye, di heman demê de û li gorî vê lêkolînê tu lêpirsîn bi şêweya giştî li ser medayan nehatiye kirin, tê wê wateyê ku guhdana alavên ragihandinê li ser veguhestina zanyariyên bedrest li ba jêderên serekî bû û nedikarîn lêkolînê bikin û zanyariyên ku eger heye hatibin veşartin ji aliyê desthelatdariyên dîfakto di hemû deverekê de bi dest xwe ve bînin, eger em ameje bi lêkolîna zanîngeha (Imperial College London) [1]) bikin dibêje hejmara miriyên ji ber koronayê li Dîmeşqê tê ragihandin rêjeya 1.25% ji hejmara rasteqîne ya miriyan derbas neka, em ê bibînin ku em li hember valahiyeke mezin ji zanyariyan e nûçeyên rojnamevanî nikarin romal bikin.

Û bi nebûna lêpirsînên rojnamegeriyê û daketina rêjeya şirovekirinên dengûbasan bo 5%, em ê bibînin ku alavên ragihandina xwendinî nikare wê valahiyê dagire, cûdabûna navbera daxuyaniyên fermî û rastiya li ser erdê ku lêkolîna me berê jî bi bîr aniye bi gelekî ji tişta ku di jêderên fermî de tê gotin xerabtir e.

**Belavbûna rêjeya beşê ku petaya koronayê di ragihandina xwendinî de hatiye**





Şêweya hejmar (3) belavbûna madeyên girêdayî bi petaya covid-19 li ser curên madeyên rojnamegeriyê di alavên ragihandina xwendinî de diyar dike.

Dema em berê xwe bidin alavên ragihandina dîtinî em ê bibînin tevî ku bilindbûnek di rêjeya naveroka girêdayî bi petaya covid-19 di van alavan de bi hemû aliyên siyasî de heye, lê bi tenê 4.29% di beşên tendirustiya xwecihê de ye, hevdemê rêjeya 37.14% di beşên siyasiya xwecihî de belav bûne, em dikarin têbînî bikin ku di alavên dîtinî de guhdan bi bandora petayê li ser werzişa xwecihî û cîhanî hatiye kirin bêtir bû ji romalkirina bandora wê nexweşiyê di beşên tendirustî de, rêjeya madeyên girêdayî bi petayê di beşên werzişê de gihişt 5.71% ji hejmara giştî ya bi rewşa nexweşiyê ve girêdayî.

Ev hejmar nişana paşketineke mezin di pêşkêşkirina zanyariyên rizgarkar ji jiyana mirov de, û romalkirina nûçeyên bersivdana kadrên tendirustî ji nexweşî û deverên belavbûna wê re dide zanîn, lewra romalkirina rasteqîne ji alavên ragihandina dîtinî ji petayê re gelekî ji rêjeya madeyên girêdayî bi vayrosa koronayê yên belavkirî kêmtir e. Romalkirina wan alavên ragihandinê bêtir ronî xistiye li ser derencamê petayê yên siyasî, civakî û çalakiyên rojane li ser hesabê ku hewla pêşkêşkirina zanyariyên piştraskirî derbarê çawaniya belavbûna petayê û rêkarên pêwîst ji xweparastinê bide.

## Belavbûna rêjeya beşê ku petaya koronayê di ragihandina dîtinî de hatiye





Şêweya hejmar (4) belavbûna madeyên rojnamegerî yên girêdayî bi petaya covid-19 li ser beşên rojnamegerî di alavên ragihandina dîtinî de diyar dike.

Herweha li gorî dateyên taybet bi belavbûna curên rojnamegerî yên kenalan berhem anîne, rêjeya herî zêde mijara petaya covid-19 aniye ziman di nav bûltena nûçeyan de bi rêjeya 42.86% bû, li hember de, rêjeya lêkolînên belgekirî derbarê romalkirina petayê de bi rêjeya 2.86% her bi hema rêjeyî bi hevdîtinên zindî bi pisporan re, ev rêje gelekî kêm e dema behsa pêwîstiya belavkirina zanyariyên piştrastkirî û eşkerekirina rastiyên ku bi fermî nehatine ragihandin, ne bi tenê ciyawaziya berfereh ya pêşbênîkirî navbera belavbûna nexweşiyê li ser erdê û hejmara ragihandî garantî dike, lê belê di gelek aliyên bersivdana bi petayê di Sûriyê de.

Hêjayî amejekirinê ye ku rêjeya bernameyên hemereng yên baş ku peta eniye ziman bi rêjeya 31.43% ji romalkirina giştî ya kenalên girêdayî bi petaya koronayê bû, rêklamên huşyarkirinê û bernameyên pêkenok û rengeren ji bo belavkirina nûçeyên rast li ser petayê li xwe digirt, lê ev rêje bernameyên ku tê de koronayê anîne ziman weke bûyerên girêdayî bi jiyana rojane ve bê nîşanên din diyar kiribû, dihêle di pêşkêşkirina zanyariyên rizgarkar de ku divê beşeke sereke di alavên peywendiyan be bê sûd bin.

Her yek ji raportên nûçeyan û bernameyên diyalogî heman rêjeyê ji aliyê naveroka girêdayî bi petaya covid-19 bi rêjeya 10% bû beşek jê zaniyariyên bisûd ji şopîneran re heye, lê nakeve cihê kêmasiya di raportên lêkolînên pêwîst de heye da ku aznyariyên rast bi destê temaşevanan di Sûriyê de gihîne. Ew yek dihêle romalkirina kenalên televizyonî li Sûriyê nekaribe zanyariyên temam derbarê petayê de bi şopîneran gihîne ji ber ku egerên mezin di nebûna zanyariyên rast ji sûriyan re hene, ew jî lêkolîneke berfereh divê ne wek yên bernameyên normal diwaşînin.

## Belavbûna rêjeya cure rojnamevanî ku petaya koronayê di ragihandina dîtinî de hatiye





Şêweya hejmar (5) belavbûna madeyên rojnamegerî yên girêdayî bi petaya covid-19 li ser beşên rojnamegerî di alavên dîtinî de diyar dike.

Eger em bala xwe bidin beşên ku ameje bi mijara koronayê kirine bi nûçeyên petayê di ragihandina bihîstî ( Yên Sûrî) re beşê herî zêde romal kiriye beşê siyasiya xwecihî bû bi rêjeya 38.6% ji koma romalkirina nûçeyên veyrosa koronayê, piştre beşê hemereng tê bi rêjeya 31.58%, hema di beşê romalkirina taybet de di beşê tendirustî de bi rêjeya 8.77% bû, ew yek dihêle ku derfeteke gelek kêm be ji zanyariyên rijgarkar ji jiyana re were dayîn ne ji sedî 10 jî, di beşê siyasiya xwecihî de ji bo romalkirirna siyasetên desthetdriya xwecihî di çawaniya bersivdana bi petayê re pêhtir li xwe girtiye lê ew zanyariyên di derbarê siyasetê de dê bimînin kêm eger bi zanyariyên rast di rêya xweparastinê û deverên belavbûna nexweşiyê di welêt de berçav neyê girtin.

Di ragihandina Sûriyê de derencamên aborî û bêjiwa jiyanê yên petayê bêtir hatin romalkirin bi rêjeya 15.79% ji koma romalkirina taybet ji nexweşiyê di radiyo de, tê şirovekirin ku ragihandina Sûriyê ji romalkirina bandora petayê bi warên xwe aborî, siyasî û bijêwî daye berçav ji pêşkêşkirina zanyariyên girêdayî wê bêtir, ji ber ku hêsan e xwe bi zanyariyan gihînin lê zehmet e amarên rast yan nêzkî wê di deverên ku peta belav bûye bi dest xwe xînin û astegî û rêgirî pir in.


## Belavbûna rêjeya beşê ku petaya koronayê di ragihandina bihîstî de hatiye




Şêweya hejmar (6) belavbûna madeyên rojnamegerî yên girêdayî bi petaya koronayê li ser beşên rojnamegerî di alavên bihîstî de diyar dike.

Eger em bala xwe bidin belavbûna romalkirinên li ser curên rojnamevaniyê, em ê bibînin ku bêhtirî romalkirinê di dema bûleyenên nûçeyan de hatiye weşandin bi rêjeya 59.65% ji koma romalkirina giştî ya girêdayî bi petaya covid-19, rêjeya lêprisînan di bûletenan 1.75% derbas nekiriye ku duyemîn biçûktirîn rêje di lêpisînêna di vê lêkolînê de di nav curên ragihandinê de çê bûne ye. Em dikarin bibêjin ku romalkirina petayê bi tenê di nava bûltenan de, nîşana wê yekê ye ku ragihandina sûrî bi tenê nûçeyên bedrest li gorî jêderên fermî û pizîşkî belav dikin, ji ber ku kelem hene wek çawaniya piştrastkirina zanyariyan ji jêderên serbixwe yan xwegihandina jêderên tendirustî bi taybet li deverên Hikûmeta Sûriyê, serbarî pêdiviyên sereke ji karê lêkolînî di serdema belavbûna petaya covid-19 ku piraniya dezgehên ragihandina Sûriyê ji ber neperepêdanê nikarîbûn dabîn bikin. Li hember de bernameyên hemareng bi romalkirinê de bi rêjeya 29.82% bû ku ew bername nikarin bi tena xwe zanyariyên rizgarkar pêşkêş bikin bi taybetî bi tena xwe ne cihê baweriyê ne di veguhestina zanyariyan di demekê de gotegot û nûçeyên nerast sala bûrî belav bûne, rêjeya raportên nûçeyan û hevdîtinên bi pisporan re 3.51% derbas nekir ew rêje gelekî kêm e û nikare huşyarkirina pêwîst belav bike ku yek ji girîngtirîn karên ragihandinê di dema petayê de ye, dibe sedeman li têçûna zêde ya anîna pisporan vegerînin ew jî rûbirûbûneke li pêş praniya dezgehên ragihandina sûrî ye ji ber kêmbûna dahatan e. Serbarî zehmetiya xwegihandina pisporên axêverên erebî di vê babetê de yan peywendî bi pisporên sûrî re di her deverekê di bin hejmûna desthelatdariyekê.

## Belavbûna rêjeya cure rojnamevanî ku petaya koronayê di ragihandina bihîstî de hatiye




Şêweya hejmar (7) belavbûna madeyên rojnamegerî yên girêdayî bi petaya koronayê li ser curên rojnamegerî di alavên ragihandina bihîstî de diyar dike.

Alavên ragihandina Sûriyê dema petaya covid-19 de tiştek eşker kir ku bi tenê romalkirin li ser jêderên bedrest û jêderên fermî ne, bê ku hewlên nû ji eşkerekirina zanyariyên kêm û dagirtina dûrbûna navbera rastiyê û daxuyaniyên fermî yên dibe ku rêjeya mezin ya pêketiyan veşartibe hebe. Herweha daketina rêjeya madeyên rojnamevanî girêdayî  bi tendirustiya giştî û zanyariyên pizîşkî yên girîng di romalkirina taybet bi petayê de kêmasiyekê xuya dike. Hemû alavên ragihandî bi hersê curên xwe (Xwendinî, Dîtinî û Bihîst) yên her aliyeke siyasî di xalên lawaz de hevbeş in ew yek ferediya yekê piştrast dike; kêmbûnek di zanyariyên rast derbarê petaya koronayê di hemû alavên sûrî de heye.

## Werzê duyem: Bandora siyasî li ser romalkirina rojnamevanî ji petaya covid-19 li Sûriyê de

Ev werz hewl dide bersiva ferediya duyem di lêkolîna derbarê bandora siyasî yan newekheviya navbera alavên ragihandinê bi hemû aliyên xwe yên siyasî di romalkirina petaya ku bû sedema vayrosa nû bide, dê berewerdî navbera romalkirina alavên ragihandinê li gorî hejmarên di madeyên girîdayî bi petayê li ser bingeha datayên komkirî ji aliyê lêkolînerên vê lêkolînê çê bike Ji ber wê yekê alavên ragihandinê li gorî nerînên siyasî û devera kar were dabeşkirin:

- Alavên ragihandinê di deverên di bin destê Hikûmeta Sûriyê.
- Alavên ragihandinê di Bakur Rojavayê Sûriyê û Turkiyê.
- Alavên ragihandina di deverên rêveberiya xweser ya Bakur û Rojhelatê Sûriyê.

Li gorî datayên komkirî alavên ragihandinê di herêmên hikûmeta Sûriyê de ji koma madeyên hatin şopandin ya herî bilind e di romalkirina petaya koronayê bi rêjeya 53.71%, tevî wê yekê jî rêjeya madeyên terxankirî ji beşê tendirustiya girêdayî  bi koronayê re ji koma madeyên hatine şopandin 8.26% bû bêtir romalkirina li ser bandorên siyasî û aboriya xwecihî bû ku herdu beş bi rêjeya 20.66% û 6.61% bûn.

Romalkirina di alavên ragihandina navbûrî de, wek fişarek ji hikûmeta Sûriyê ne da ku bandora nerênî ji sizayên li ser sepandî diyar bike, û banga nehiştina sizayan bike. Herweha dixwze neserkeftina hikûmeta rêjîmê di rêvebirina kirîzê bi derencamên bargiraniya aborî yên sizeyan û paşketina berçav di xizmetguzariyan di nav de kerta tendirustî ve girê bide.

Li gorî van hejmaran diyar dibe ku alavên ragihandina Sûriyê yên di herêmên hikûmeta Sûriyê de bêhtir ronî xistine ser bandora  petayê, tevî bilindbûna rêjeya naveroka girêdayî bi koronayê re, lê rêjeya romalkirina baş di beşê tendirustiyê de ne bilind e, tê wê wateyê beşê herî mezin ji romalkirina girêdayî bi covid-19 zanyariyên ku diviyabû pêşkêş bike ji şopîneran re di alavên peywendiyan de neweşandiye. Beşê hemarengan, beşê aborî û siyaseta navdewletî di ragihandina hikûmeta Sûriyê rêjeyek bilind ji romalkirina taybet bi covid-19  cih girtiye, rêjeya romalkirina yekem gihişt 10.74% romalkirina duyem gihişt 5.78%.

Tevî ku beşê hemarengan rêklamên taybet bi huşyarkirinê li xwe digire lê beş madeyên ku petayê tîne ziman bê ku zanyariyên bisûd pêşkêş bike jî tê de heye. Weke me lêkolîna zanîngeha (Imperial College London) de berê aniye ziman jî, gumanên piştevankirî ji lêkolînên zanistî derbarê mijarê di rastbûna hejmaran di jêderên fermî yên hikûmeta Sûriyê tîne ziman de heye, zêdebûna rêjeya romalkirinê cihê kêmasiya di zanyariyên piştraskirî de nagire.

Derbarê alavên ragihandinê di herêmên opozisyonê di Bakur Rojavayê welêt û Turkiyê de, rêjeya madeyên belavkirî yên girêdayî bi petayê ji yên alavên ragihandina di herêmên hikûmeta Sûriyê de kêmtir in, ji koma madeyên şopandî di vê lêkolînê de rêjeya 36.84% bû. Li hember de rêjeya madeyên dabeşkirî ji beşê petayê re ji koma madyên şopandî 7.23% bû eb rêje ji yên ragihandina hikûmeta Sûriyê nêzîk e, tê wateya ku rêjeya romalkirinê ji petayê re nêzîkî hev in, li hember de guhdana alavên ragihandina herêmên opozisyonê bi belavkirina naverokên di beşên hemareng, siyaset û aboriyên navdewletî derbarê petayê de kêm e rêjeya naveroka girêdayî bi vayrosa koronayê di herdu beşan de gihiştiye 6.57% û 2.63.

Rêjeya romalkirina siyasta xwcihî girêdayê bi petaya koronayê di alavên ragihdina herêmên opozisyon û Turkiyê bi asteke kêmtir bû, ji ber ku alavên ragihandinê di van herêman de datayên fermî yên Desteya Tehrîr Elşam (Hikûmeta Înqaz di Îdlibê) belav nedikrin bi tenê eger pêwîst ba ew yek hişt ku rêjeya bi tenê 10.52% be ew jî rêjeyeke ji nîvî kêmtir e bi hevşanê xwe di herêmên Hikûmeta Sûriyê ku bi berdewamî datayên fermî ji hikûmetê rêjîmê derdikeve.
Derbarê romalkirina bandora petayê ya aborî û bijêwî em ê bibînin ku alavên ragihandina herêmên opozisyonê ji hevşanê xwe di hikûmeta Sûriyê û Rêveberiya Xweser de pirtir e, ew yek bi zelalî cûdabûna şêweya romalkirinê li ser bingeha nerînên siyasî diyar dike.

Derbarê alavên ragihandina Rêveberiya Xweser li Bakur Rojhilatê Sûriyê, em ê bibînin ku rêjeya romalkirina petaya koronayê gihişt 39.31%, ew rêje nêzîkî rêjeya romalkirina ragihandina opozisyonê ye. Li hember de em ê bibînin ku romalkirina ektîv di beşê tendirustî de ji yên hevşanê xwe kêmtir bû gihişt 3% ji koma madeyên şopandî, romalkirina petayê di beşên hemareng de rêjeya herî bilind bû bi 16% ji koma madayên şopandî bû ew rêje ya herî mezin di nav hevşanên xwe di herêmên opozisyonê û rêjîmê de.

Romalkirina bandora  petayê ya siyasî û bijêwî bi rêjeya 9% û 4.27% bû, ew rêje ji yên alavên ragihandinên din kêmtir bû, li gorî van hejmaran diyar dibe ku alavên ragihandina Rêveberiya Xweser pêhtir ronî xistiye ser belkavkirina naveroka girêdayî bi vayrosa koronayê di beşên hemareng de û asta pêşkêşkirina zanyariyên bisûd di beşê tendirustî de daketî bû. Dibe ku hin sedem jê wê yekê re hebin wek hejmara pêketiyên bi koronayê di wê demê de li herêmên Rêveberiya Xweser ne zêde bû herweha bandora petayê li ser bijêwa şêniyan bi sedema hebûna girjiya ji derencamên şerê ku di dawiya 2019an de rû daye.

Li gorî şirovekirina datayên bûrî, em ê bibînin cûdabûnek zelal di romalkirina alavên ragihandina Sûriyê bi hemû nerînîn xwe ji petaya covid-19 re hebû alavên ragihandina herêmên hikûmeta Sûriyê de bêtir ameje  bi bandora petayê ya siyasî û bijêwî kiriye, di herêmên opozisyonê û Turkiyê de rêjeyek baş dan pêşkêşkirina zanyariyên tendirustî, li herêmên Rêveberiya Xweser ya Bakur Rojhilatê Sûriyê ragihandina wê ronî xistiye ser naverokên girêdayî bi petayê di beşên hemareng de, ew yek dibe belgeyek baş ji çespandina ferdiya duyem di lêkolînê de ya ku dibêje; Cûdabûna navbera romalkirina ragihandinê li gorî nerînên siyasî ne.

| **Nerîna siyasî** | Siyaseta xwecihî | Aborî û bijêwa xwecihî | Aborî û siyaseta navdewletî | Tendirustî | Hemareng | Çand | Werziş | Girêdayî bi petayê | **Şopandina giştî** |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| Alavên ragihandina herêmên rêjîma Sûriyê | | | | | | | | | |
| **Rêjeya li ser sedî** | **20.66%** | **6.61%** | **5.78%** | **8.26%** | **10.74%** | **1.65%** | **0%** | **53.71%** | **100%** |
| **Alavên ragihandina herêmên opozisyon û Turkiyê** | | | | | | | | | |
| **Rêjeya li ser sedî** | **10.52%** | **7.89%** | **2.63%** | **7.23%** | **6.57%** | **1%** | **1%** | **36.84** | **100%** |
| **Alavên ragihandina Rêveberiya Xweser ya Bakur Rojhilatê Sûriyê** | | | | | | | | | |
| **Rêjeya li ser sedî** | **9%** | **4.27%** | **3%** | **3%** | **16%** | **3%** | **0%** | **39.31%** | **100%** |

Şêweya hejmar (8) belavbûna medayên şopandî li gorî aliyên siyasî ji alavên ragihandinê û beşên ku madeyên rojnamevanî belav kirine diyar dike

## Werzê sêyem: Danûstandin bi koma zanyariyên şaş û gotegotan re


Ev werz hewl dide danûstandinê bi pirsa taybet bi ferediya sêyem di vê lêkolînê de bike ku girêdayî ye bi spartina ragihandina sûrî bi hemû aliyên xwe ve ji zanyariyên şaş re em ê pişta xwe ji hewla bersiva vê pirsê, bi datayên şopandina nûçe û jêder û armancên giştî ji madeyên belavbûyî bi petayê re girêbidin herwha dûbera peyvên rênîşander yên girêdayî bi petayê û datayên wê re.

Ji ber ku feredî bi hemû alavên ragihandinê bi hemû aliyên siyasî ve dide û distîne, dabeşkirina berewerdiyê dê li ser bingeha curê alavên ragihadinê (Xwendinî, Dîtinî û Bihîstî) be da ku cûdabûyên di navbera wan curan de û amejaya giştî derbarê vê doseya zîndî di destnîşankirina karîna alavê di pêşkêşkirina zanyariyên rizgarkar ji jiyanê re şirove bike. Bi taybet rêjeyek mezin ji zanyariyên şaş û gotegotan derbarê rêyên çareseriya ne teqlîdî û nerast re heye, yan ser ast û deverên belavbûna nexwşiyê, ew yek gefekê ji jiyana pir kesan re çê dike eger ew zanyariyên şaş weke ya rast di çawaniya xweparastinê û çareseriyê de hijmartin.
Derbarê alavên ragihandina xwendinî, li gor şirovekirina datayên şopandina ku lêkolînerên Navenda Sûrî ya Ragihandina Xwendinî encam dane diyar dibe ku hemû nûçeyên girêdayî bi petaya covid-19 yên hatine şopandin bi tenê nûçeyên nû bûn, tu madeyên rojnamevanî yên gotegot û nûçeyên nerast derbarê petayê de serast bike tune bûn.

Cihê amejerkirinê ye ku herî kêm malperek sûrî heye guhdanê dide serastkirina nûçeyên şaş, lê ew ne di çarçoveya şopandina me de bû, di vê lêkolînê de diyar bû ku nehevkariyek alavên ragihdinê bi dezgehên taybet bi rastkirina nûçeyên nerast heye. Nebûna tu rastkirinek ji zanyariyên şaş û nîşanên veguhestinê derbarê covid-19 de valahiyeke metirsîdar e, di romalkirina ragihandinê ji nûçeyên petayê re. Bi teybet tibabek ji zanyariyên şaş û nerast hene eger pişt pê girêdin jiyana xelkê dixin metirsiyê de. Li gorî datayan alavên ragihandina sûrî nikarîbûn naverokek guncaw di vê derbarê de ji bo serastkirina gotegotan û zanyariyên şaş de pêşkêş bikin.

Tê wateyê ku rola taybet ya pêşkêşkirina zanyariyan ne bi tenê belavkirin e, lê erk e ku bi temamî rola wê hebe derbarê alavên teqlîdî ku baweriya wan hene ji yên torên civakî bêhtir, erk e zanyariyên şaş yên belavbûyî rast bike ji ber ku yek ji stûnên serekî ye di belavkirina zanyariyên rizgarkar di petaya covid-19 de.


## Belavbûna rêjeya cure nûçeya ku petaya koronayê di ragihandina dîtinî de hatiye




Şêweya hejmar (9) belavbûna cure nûçeya girêdayî bi romalkirina petaya covid-19 di alavên ragihandina dîtinî de diyar dike.

Derbarê jêderê, piraniya madeyên belavbûyî di alavên ragihandina (Rojname, Malper û Ajansan) de piştî bi jêderên yekîm girêdidan ew nûçe jî li gorî daxuyaniyên berpirsên fermî di desthelatdarî yan dezgehên navdewletî karker di herême de ne ji wê Rêxistina Tendirustiya Cîhanî û nivîsgehên wê yên navnetewî. Rêjeya nûçeyên piştbi jêderên yekîm girê dane ji koma madeyên taybet bi şopandina covid-19 rêjeya 90.00 % bû lê madeyên rojnamevanî yên pişt bi jêderên nefermî ku weke ji alavên din tîne ji koma madeyên romalkirî bi petayê bi rêjeya 10% bû.

## Belavbûna rêjeya cure nûçeya ku petaya koronayê di ragihandina dîtinî de hatiye





Şêweya hejmar (10) belavbûna jêdera madeyên rojnamegerî yên girêdayî bi romalkirina petaya koronayê di alavên ragihandina xwendinî de diyar dike.

Li hember de, eger em bala xwe bidin belavbûna armancan ji madeyên rojnamevanî, di romalkirina ragihandina xwendînî ji petaya ku bû sedema vayrosa nû, em ê bibînin peşveçûnek di rêjeya madeyên taybet bi huşyarkirinê de hebû rêjeya wê ji koma romalkirina taybet bi koronayê 10% ye, lê veguhestina zanyariyan bi rêjeyeke bilind bû gihişt 77.5%.

Di vê encamê beşek serekî ji erkê alavên ragihandinê di dema petayê de diyar nebûye yan bo pileya dawiyê paşketî ye, tê wateyê ku romalkirina pêwîst ji petaya koronayê û rola pêwîst ji alavên ragihandinê di petayê de kêmasiyek berçav di beşekî girîngs de hebû.

**Belavbûna rêjeya armanca giştî ji gotarên ku petaya koronayê di ragihandina xwendinî de hatiye**




Şêweya hejmar (11) belavbûna madeyên şopandî yên girêdayî bi petaya koronayê li ser bingeha armanca madeya rojnamevanî diyar dike

Derbarê dûbarkirina peyvên rênîşander di madeyên girêdayî bi romalkirina petayê di ragihadina xwendinî de, rêjeya herî mezin ji dûbarebûnê bi peyvên giştî ve girêdayî bûn ku nîşan bi vayrosê didin, di heman demê de dûbarkirina peyvên taybet bi hevokên destpêkî taybet bi zanyriyên xweparastinê, çaresekirinê û çawaniya belavbûna nexweşiyê gelekî kêm bûn di şopandina ragihandina xwendinî û yên girêdayî bi petayê de hevoka (Rêkarên xweparastinê) 9 caran di her madeyekê de dûbare bûye ji bilî wê kêm hatine bikaranîn. Ev date nîşaneke girîng e ji kêmbûna zanyariyên pêşkêşkirî ji şopîneran re di ragihandina xwendinî derbarê xweparastin û rêyên xwedûrxistinên ji nexweşiyê.


| Peyv | Dûbarebûn |
| --- | --- |
| Vayrosa koronayê | 123 |
| Kerentîn | 32 |
| Covid-19 | 13 |
| Weba | 12 |
| Peta | 10 |
| Rêkarên xweparastinê | 9 |
| ,Xweparêzî Parastin | 8 |
| Belavbûna nexweşiyê | 5 |
| Çareserkirina nexweşiyê | 2 |
| Huşyarkirin | 2 |
| Girtina sînoran | 2 |
| COVID-19 | 1 |
| Hilmetên huşyarkirinê | 1 |
| Coronavirus | 0 |
| Belavbûna petayê | 0 |
| Girtina giştî | 0 |
| Rêyên çareserkirina nexweşiyê | 0 |

Şêweya hejmar (12) xişteya gotinên rênîşander di nav madeyên şopandî yên girêdayî bi petaya covid-19 di ragihandina xwendinî de diyar dike

Eger em berê xwe bidin ragihandina dîtinî em ê bibînin ku rêjeya nûçeyên ku zanyariyên şaş serast kirine gihişt 7.14% ew rêje ji ragihadina xwendinîn de bilindtir e, lê dîsa dimîne rêjeyek lawaz li hember belavbûna nûçeyên şaş, ji rêjeya 92.86% ya nûçeyên nû diyar dibe ku alavên ragihandina dîtinî xwestin guhdanê bidin nûçeyên nû, di demekê de pêwîstiya şopînerên Sûriyê di serastkitina nûçeyên şaş yên gefê didin jiyana mirov de hebû.

Li gorî van dateyan nîşan bi yekê dide ku kêmbûnek mezin di piştraskirina zanyariyên şaş di ragihandina dîtinî de hebû, dihêle em bibêjin valahiyek mezin di xwegihandina madeyên taybet bi romalkirina petaya ku bûye sedema vayrosa nû de heye

## Belavbûna rêjeya cure nûçeya ku petaya koronayê di ragihandina dîtinî de hatiye





Şêweya hejmar (13) belavbûna rêjeya curê nûçeya girêdayî bi petaya covid-19 di alavên ragihandina dîtinî de diyar dike

Li aliyekî din, em dikarin daketina piştrasbûna zanyariyên ku alavên ragihandina dîtinî li hember ragihandina xwendinî li ser bingeha nîşana cure jêderê bi aweyekî mezin têbînî bikin, nêzîkî nîvî nûçeyên ku hatine pêşkêşkirin ji koma romalkirina girêdayî bi (Petaya covid-19 bi rêjeya 47.14%) ji jêderên neserekî bûn hema nûçeyên rêjeya nûçeyên ji jêderên serekî yên li gorî daxuyaniyên fermî û nûçeyên nûçegîhan didin alavên ragihandinê bi rêjeya 52.86% bû.

Li gorî vê nîşanê tê têbînîkirin ku hûrbîniya zanyariyan dema veguhestinê ji jêderek nefermî bo jêdereke din kêm dibe, ew yek gefan li bawirya gelek zanyariyên ku alavên ragihandinê dema romalkirina petayê dike. Tevî ku piştgirêdana televizyonan li ser nûçeyên ku rojname belav dike tiştekî normal e lê bilindbûna rêjeya vê piştgirêdanê nîşana wê yekê dide ku hûrbîniya van zanyariyên pêşkêşkirî cihê gumanê ne, ew jî valahiyeke nû di alavên ragihandina dîtinî (T.V) di romalkirina ektîv de dirust dike.

## Belavbûna rêjeya cure nûçeya ku petaya koronayê di ragihandina dîtinî de hatiye




Şêweya hejmar (14) belavbûna madeyên rojnamegerî yên taybet bi romalkirina petaya covid-19 di alavên ragihandina xwendinî de diyar dike.


Derbarê dûbarebûna peyvên rênîşander yên girêdayî bi romalkirina petaya koronayê, em ê bibînin ku rêjeya wan dûbarekirinan wek yên di ragihandina xwendinî de ye, cûdahî navbera dûbarbûna gotinên ku bi giştî li ser vayrosa koronayê û petayê ne bi gelekî ji gotinên rênîşanderên teybet bi pêşkêkirina zanyariyan derbarê belavbûna nexweşiyê yan rêyên rast ji çawaniya parastinê zêdetir in, tê wateyê ku nebûna zanyariyan û paşketina wan li hember nûçeyên giştî ji petayê re bê ku zanyariyên pêwîst werin pêşkêşkirin heye.

| Peyv | Dûbarebûn |
|---|---|
| Vayrosa koronayê | 308 |
| Weba | 53 |
| Coronavirus | 51 |
| ,Xweparêzî Parastin | 32 |
| Peta | 24 |
| Rêkarên parastinê | 24 |
| Belavbûna nexewşiyê | 18 |
| Belavbûna petayê | 17 |
| Kerentîn | 13 |
| Covid-19 | 12 |
| Girtina giştî | 10 |
| Girtina sînoran | 8 |
| Huşyarkirin | 7 |
| COVID-19 | 5 |
| Rêyên çareserkirina nexweşiyê | 2 |
| Dermanê nexweşiyê | 2 |
| Helmeta huşyarkirinê | 2 |

Şêweya hejmar (15) xişteya dûbarebûna gotinên rênîşander yên taybet bi romalkirina petaya covid-19 di madeyên şopandî di alavên ragihandina xwendinî de diyar dike.

Ji aliyê xwe ve karê alavên ragihandina bihîstî wekhev bûn di nav nîşanên taybet bi hûrbînîkirina zanyariyên li ba alavên ragihandina din, rêjeya nûçeyên taybet bi serastkitina zanyariyên şaş bi romalkirina petaya covid-19 gelekî kêm bûn ji koma nûçeyîn romalkirî bi petaya koronayê bi tenê 5.26% bû, di demekê de rêjeya nûçeyên nû 94.74% bû tê wateyê ku radiyoyên Sûriyê biryara wekhev ji kenalên televizyonî û rojnameyan daye ew jî ronîxistina romalên xwe derbarê petayê li ser nûçeyên nû ne bê ku guhdana beşek ji madeyên xwe bidin serastkirina zanyariyên şaş û goteotên belavbûyî.


## Belavbûna rêjeya cure nûçeya ku petaya koronayê di ragihandina bihîstî de hatiye




Şêweya hejmar (16) belavbûna curê nûçeyên girêdayî bi romalkirina petaya covid-19 di alavên ragihandina bihîstî de diyar dike.

Eger em bala xwe bidin nişana curê jêderê ku girîng e  di nirxandina rastiya nûçeyên belavkirî di alavên ragihdinê de heye, alavên ragihandina bihîstî di Sûriyê de gavek ji ragihandina dîtinî de di warê piştgirêdana bi jêderên serekî ve avêtiye rêjeya van nûçeyan ji koma romalkirina petayê 85.96% bû rêjeya nûçeyên li gorî jêderên nerserekî belav kirine 14.4% bû ew rêje jî baş e berewerdî bi kenalên televisyonî re lê her piştîgirîdayî bi jêderên neserekî ji ragihandina xwendinî ve dimîne ku encama herî baş di vê nîşanê de bi dest ketiye.


## Belavbûna rêjeya cure nûçeya ku petaya koronayê di ragihandina bihîstî de hatiye




Şêweya hejmar (17) belavbûna jêdera madeyên rojnamegerî yên taybet bi romalkirina petaya covid-19 di alavên ragihandina bihîstî de diyar dike

Tevî bilindbûna rêjeya madeyên girêdayî bi huşyarkirinê di alavên ragihandina bihîstî de lê berê giştî li ser belavbûna armancên madeyên rojnamevanî di radiyoyên Sûriyê de dimîne newekheviyek wek di hemû alavên ragihandinê de heye, herweha radiyoyên Sûriyê li gorî peyvên rênîşander li ser guhdana zanyariyê giştî parast lê lawazbûnek mezin di zanyariyên taybet bi xweparastinên li gorî datayên bi dest me ketine di çarçoveya şopandinê de heye.

## Belavbûna rêjeya armanca giştî ji gotarên ku petaya koronayê di ragihandina bihîstî de hatiye




| Peyv | Dûbarebûn |
|---|---|
| Vayrosa koronayê | 288 |
| Parêzî û parastin | 48 |
| Kerentîn | 38 |
| Hilmetên huşyarkirinê | 37 |
| Coronavirus | 37 |
| Rêkarên xweparastinê | 35 |
| Huşyarkirin | 24 |
| Belavbûna nexweşiyê | 22 |

| | |
|---|---|
| Belavbûna petayê | 20 |
| Weba | 15 |
| Peta | 8 |
| Covid-19 | 6 |
| COVID-19 | 3 |
| Girtina sînorê | 2 |
| Girtina giştî | 1 |
| Rêyên çareserkirina nexweşiyê | 0 |
| Çareserkirina nexweşiyê | 0 |

Di datayên bûrî de diyar dibe, û bi berewedkirina alavên ragihandinê di rêya gelek nîşanên ku doseya hûrbîniya zanyarî û serastkirina gotegotan lêkolîn kiriye, alavên ragihandina Sûriyê nikarîbû rûbirûyê pêla mezin ya gotegot û zanyariyên şaş bibe, ew yek jî ferediya sêyem tekez dike.

## Rênima

- Divê alavên ragihandina Sûriyê bi hemê aliyên xwe yên siyasî û dezgehên xwe rûbereke baş bidin pêşkêşkirina zanyariyên tendirustî ji jêderên piştraskirî wek Rêxistina Tendirustiya Cîhanî yan rêxistinên pizîşkî yên navdewletî û xwecihî di welêt de, da ku berê şopîneran bidin rêyên herî baş di xweparastinê de.
- Divê alavên ragihandina Sûriyê rûberek û madeyên mezitir li ser bingeha jêderên pizîşkî rast û bi hevkariya pisporan bidin mijara serastkirina gotegot, nûçeyên şaş û yên gefxwar ji jiyanê re.
- Derfeteke mezintir bidin pisporan di alavên ragihadinê ew ê di warê başkirina cure zanyariya ku welatiyê sûrî derbarê petaya covid-19 werdigre bisûd be.
- Divê desthelatdariyên xwesepandî di welêt de destêwedanê di romalkirina ragihandinê ji petaya covid-19 de nekin.
- Divê desthelatdariyên dîfakto di welêt zanyariyên hûrbînî û rast derbarê belavbûna petayê û qurbaniyê wê de pêşkêş bikin.
- Zêdekirina rahênana rojnamevanan li ser lêpirsîn û lêkolînan.
- Zêdekirina dahatên dezgehên girêdayî bi pêşxistina alavên ragihandinê ku kar li ser bilindkina molarên rojnamevanan li aliyekî dike li aliyê din dabînkirina huşyarkirinê bi danûstandina pîşeyî bi qeyranan û hewlidana kar li ser dabînkirina pêdiviyên pêwîst dike.

# Çavkanî:

1 Raporteke ajansa Rueters tê de yekem pêketina vayrosa koronayê li bajarê Qamişlo yê di bin destê Rêveberiya Xweser li Bakur Rojhilatê welêt de ragihandiye, eşkere dike ku berpirsên herêmên Hikûmeta Sûriyê encama testa wê rewşê bi mebest ew agahdar nekirine. Lînk

2 Di vê demê de rêjeya pêketina rojane li gorî amarên fermî ji wezareta Tendirustiyê di Hikûmeta Sûriyê de derdiketin zêde bûn, herweha yekem rewşa pêketina bi koronaya nû li Bakurê Rojavayê Sûriyê hat tomarkirin.

Derbarê hejmara miriyan lînka raporta malperê CNN. Lînk

Lînka raporta Inib Elbeledî derbarê tomarkirina yekem rewşa pêketinê li Bakur Rojavayê welêt, lînk

3 Watson, O.J., Alhaffar, M., Mehchy, Z. et al. Leveraging community mortality indicators to infer COVID-19 mortality and transmission dynamics in Damascus, Syria. Nat Commun 12, 2394 (2021). Lînk

المركز السوري للإعلام وحرية التعبير

Navenda Sûrîyayî ya Ragihandinê û Azadîya Derbirînê

Syrian Center for Media and Freedom of Expression


للإطلاع على تقاريرنا السابقة باللغة العربية
https://scm.bz/

للإطلاع على تقاريرنا السابقة باللغة الانكليزية
https://scm.bz/en/

للإطلاع على تقاريرنا السابقة باللغة الكوردية
https://scm.bz/kmr/